

«Nabe Kurdistana Sûriyê û Herêma Kurdistanê bibe meydana şerê Tirkîyê û PKKê»



Kurdistan

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) derbarê êrişên Tirkîyê li ser Kurdistan Sûriyê û Herêma Kurdistanê radigihîne, nabe Kurdistan Sûriyê û Herêma Kurdistanê bibin meydana şerê di navbera Tirkîyê û PKKê de.

Sekreteriyana Giştî ya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) ENKSê îro 24ê Mijdara 2022an di daxuyaniyekê de ragihand, "Tirkîyê ji berbanga 20ê Mijdarê ve, dest bi êrişên asmanî li ser gelek xalên navçeyên sînorî yên di nav axa Sûriyê de û li ser deverên Kurdî ji Dêrikê li rojhilat û

heta gundewarê bakurê Helebê li rojava kiriye û navendên binesazî, xizmetguzarî û elektirîkê kirin armanc, di encama van êrişan de jî gelek sivîl hatin kuştin û birîndarkirin." ENKS amaje bi wê kir jî: "Bombebarana Tirkîyê gihîste baregehên PKKê yên di nava Herêma Kurdistanê de ku di heman demê de jî Supaya Pasdarên Îranê bi mûşek û dronên bombekirî êrişî xaka Herêma Kurdistanê, kampên koçberên Kurd ên Kurdistana Îranê û baregehên partiyên wê kirin." ENKSê diyar kir jî, Îran bi van êrişên ji destpêka serhildana

gelên Îranê ya li dijî rejîma zordar a Tehranê, hewl dide bi êrişê li ser Herêma Kurdistanê, kirîza xwe ya navxweyî derxîne derve. Her wiha ENKSê dibêje: "Ev operasyon, ji bilî bînpêkirina serweriya Sûriyê û Iraqê ji aliyê welatên cîranên Tirkîyê û Îranê ve, ew gefeke cidî ye li aramiya navçeyê û ewlekarî û selametiya welatiyan e rewşeke tires li navçeyên Kurdî li Sûriyê çêdike." Di daxuyaniyekê de hat gotin: "ENKS tevî şermezarkirina van êrişan ku dibin sedema karesatan, ew daxwaza rawestandina wan dike û tekez dike ku operasyonên bi vî

rengî, rewşê aloztir û xirabtir dikin û tekane rê ji bo çareserkirina pirsgerêkan, zimanê diyalogê û dîplomasiyê ye." Herwiha di daxuyaniyê de hat: "ENKS tevî ku red dike Herêma Kurdistanê û Kurdistana Sûriyê bibe meydana operasyonan û çareserkirina hesaban di navbera PKK û Tirkîyê de, di heman demê de daxwaz ji civaka navdewletî û hikûmeta Iraqê dike ku bi berpirsariya xwe rabin û rê nedin rêjîm Pasdarên Îranê ku êrişên ser Herêma Kurdistanê bikin." Herwiha ENKS bang li Amerîka, Rûsya û

hêzên Hevpeymanan dike ku destwerdanê bikin ji bo rawestandina operasyon û êrişên asmanî yên Tirkîyê li ser axa Sûriyê û aloziya li ser her du aliyên sînor rawestînin. Di dawiyê de ENKSê bang li gelê Kurd û hemû xelkê herêmê kir ku bi cih û warê xwe bimînin, aştîya sivîl biparêzin û hevkarî û nirxên pêkvejiyanê di navbera xwe de bilind bikin. Şanderê Emerîka bo Bakurê Rojhilatê Sûriyê Nicholas Grainger di kongrekî rojnamevanî de bi rêya online derbarê êrişên vê dawiyê yên Tirkîyê ser Kurdistana Sûriyê û jin deverên din ragehand, welatê wî li dijî her karekî leşkerî ye ku dihêle rewşa deverê aloztir bibe û jiyana leşker û welatiyên sivîl dixwe metirsiyê de, û daxwaz kir alozî werin rawestandina. Herwiha got, tûndiya aloziyan di vê dema dawî de nayê qebûl kirin û selameta welatiyên sivîl û leşkerên wan dixwe jêr metirsiyê de, û ev kiryar şerê jinavbirina rêxistina DAIŞ asteng dike.

ENKS tekeziyê li mafê netewî yên Kurdan li Sûriyêke pir alî dike

Kurdistan

Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS, daxuyaniya dawî ya kongreya xwe ya 4emîn belav kir û tê de qedexekirina lidarketina kongreyê li bajarê Qamişlo ji aliyê hêzên asayîşê ve şermezar kir û tekezî li ser yekrêziya navmala Kurdî kir.



«Pêwîste gefên operasyonê werin rawestandî»

ENKSê 29ê Mijdara 2022an daxuyaniya dawî ya kongreya xwe ya 4emîn belav kir û tê de ragihand, "Piştî çekdarên PYDê roja 14ê Mijdarê nehiştin kongreya me ya 4emîn li hola destnîşankirî li dar bikeve, me roja 28ê Mijdarê kongreya xwe di bin navê (Ji bo Sûriyayêke piralî,



«Yekrêziya nava mala Kurd giring e»

demokrat û hevgirtî ku destûra wê mafên netewe yên Kurd li Sûriyê û hemû pêkhatayên din nas bike) de û bi riya çend civînên kongre

hat lidarxistin. ENKSê diyar kir, di civînên kongreyê de Rapora Siyasî, Bernameya Siyasî û Sîstema Bingehîn hatin gotûbêj kirin, ji bo bi qonax û pêşketinên ku bi pêşhatên kirîza Sûriyê re bûn, bigunce. ENKS amaje bi wê yekê kir, di civînên kongreyê de hejmarek biryar û rasperdeyan hatin girtin, ji wan:

- Beşdaran rêgirtina lidarxistina kongreyê li salona destnîşankirî û cihê alternatîf a ku ji aliyê çekdarên PYDê hatiye kirin, şermezar kirin.
- Hikûmeta Sûriyê di ber berdewambûna krîzê û êş û azara gelê Sûriyê de berpirs e. Di vî warî de, kongreyê bang li civaka navdewletî û welatên pêwendîdar kir ku bi erkê xwe rabin, riya çareseriyê siyasî aktîv bikin û

fişarê li rêjîma Sûriyê bikin, ta ku biryarên navdewletî û di serî de biryara 2254 cibicî bike.

- Kongreyê tekezî li ser, giringiya pabendbûna opozisyona Sûriyê bi bijardeya siyasî ya danûstandinan, yekrêziya wê û pabendbûna wê bi naveroka daxuyaniya Riyad 2, bi taybet xalên ku bi doza Kurdî ve girêdayî ye, weke pirseke niştîmanî û destûrî û naskirina mafên netewî yên gelê Kurd li Sûriyê, kir.



«Divê PKK û Tirkîyê meydana şerê xwe dûr bixin»

- ENKSê hemû cureyên bînpêkirin û tawanên komên çekdar ên ser bi Tirkîyê ve û yên

girêdayî Îtîlafê li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Sipî û guhertina demografî li wan bajaran û hemû erdnîgariya Sûriyê şermezar kir.



«Nabe grûpên çekdar li Efrînê bimînin»

- ENKSê derbasbûna Heyet Tehrîr El-Şam (Eniya El-Nusra) ya ku weke rêxistineke terorîst tê binavkirin, bo Efrînê şermezar kir û bang ji bo derxistina wê hemû komên çekdar kir.
- ENKSê bang li civaka navdewletî kir ku vegere ewle ya koçberan bo malên xwe misoger bike, rêveberiya herêmê radestî xelkê wê yên resen bike û parastina ewlekarî ji wan re peyda bike.
- ENKSê desthilata

takrewî ya PYDê li herêmê şermezar kir û bang li Hevpeymaniya Navdewletî kir rê li ber gefên Tirkîyê derbarê operasyonên leşkerî rawestîne û her wiha daxwaz ji PKKê kir ku xaka Rojava û Başûrê Kurdistanê ji bo şerê xwe yê bi Tirkîyê re bikar neyîne.

- ENKSê bal hat kişandin ser giringiya pêşxistina çanda pêkvejiyanê û xurtkirina têkiliyên di navbera hemû pêkhatayên de.
- ENKSê tekezî li ser yekrêziya navmala Kurdî kir, Ji bo xurtkirina rola encûmenê di warê neteweyî û niştîmanî de û rola Kurdan di piroseya siyasî û paşeroja Sûriyê de û bang li HSD û aliyê Amerîkî kir ku berdewamiyê bidin danûstandinên Kurdî.

Pirsgirêka Xazê berdewam e

Kurdistan-Ehmed Elî Wêstgeha Xazê, xaza malê, jibo devera cizîrê peyda dikir, ji kar derketiye, ji kar derketina wê bû sedema birîna kehrebê jî. Wêstgeha Siwêdiyê li başûrê Dêrikê dikevê, xaza malan jibo tevahiya Devera Cizîrê peyda dike.



«Pirsgirêka xazê berya êrîşê hebû»




rojane 16 hezar bitlên xazê berhem tanî, herwiha ji sedî 50 ji kehreba devera Cizîrê jî peyda dikir. Ku 130 mîga wat kehrebe berhem tanî. Lê piştî êrîşa Tirkîyê ya li 19-20 vê mehê bi yek carî berhem

anîna xazê lê sekiniye, û tenê 40 mîga wat jî ji kehreba deverê peyda dike. Welatiyek derbarê Pirsgirêka xazê li deverên me got, pirsgirêka xazê berya vê êrîşê jî hebû, û ev rêveberî

dixwaze bi van êrîşan hemû kêmasiyên x we veşêre, niha xelk bi hestera yek qenîne xaz in, divê çareseriyek ji vê pirsê re were dîtin, heger ew qenîne hebe jî bi nirxekî buha bidest dikeve, û

hemû jî ketiye destê bazirganan û xelkê di vê pirsê de istixlal dikin. Welatiyek din jî dibêje, baş e kargeha Şedadê heye û kargeheke mezin, çima xelkê me bê xaz e, çima ew ketine ber destê bazirganan, ev rêveberî nikare xizmetguzariyan ji xelkê re dabîn bike, heger xizmetguzarî ji welatiya re dabîn neke bila xwe bide aliyekî, tekez ev rêveberî bi mebest vê yekê dike.

Ji bo guhertina rewşa heyî pêwîstiya me bi çî heye



Mahir Hesên

Elmaniya

Ya giring ne kî dê biryarê bide, kî dê encam û çareserekê bike? Carenûseke hevpar heye, metirsiyeke hevpar heye û kurd li çî warî û cihî ji bilî hev girtinê neçar in. Çi li Rojhilat û Rojava, çî li Başûr û Bakur, ji her demê bêhtir niha metirsî berz û bilind dibe. Dewletên xêrnexwaz, dij-mirovayî, hov hene ku kêfxweş in ku şaristanî û bextewariya kurdan têk dibin. Ew naxwazin ku kurd bi aza û serfiraz bijîn, lê bêtir wekî ku ew

dixwazin bindest û lewaz û kole bijîn. Ev rastî bi siyasetên yekalî nayê çareser kirin û ya herî zêde bi êş û bêtaran re rûbirû tê, belkî bi nêrînek gerdûnî ya zelal ku sedem bi nav dike û ji nêzîkatî, rê û mekanîzmayan haydar, û nabe ku pêşî li pejirandina perspektîfa nêzîkbûna kurdan bigire. Dibe ku hinek bêjin ku ev şerê dewletan e, û bi çekên giran. Ev şaştîyek mezin e. Ev şer şerê ronakbîrên li hemberî hêzên pêxwas radiwestin. Mesele li vir bi ronîkirina hiş dest pê dike. Ewqas çanda mirov giringî û giraniya wê hebe û çendî li ser belavkirina wê di asta

herî berfireh de, û bi awayên nûjen, û ji bo ku her kurdek ji aliyê hevpariya xwe ya netewî ve binêre, ne ji aliyê cudahiya wî ya nijadî, olî, erdnîgarî, an jî cûdahiyek din, wê demê em ê li ber tixûb û sînoren azadiya xwe ve bi çin. Û divê her kes bi zanebûn û rast berpirsariyên xwe bigire ser milê xwe. Belê em ji bîr nekin rola giring ya medyaya kurdî bi hemû awayên xwe di proseya agadariyên li ser giringiya nirxênên neteweyî û demokratîk û bilindkirina hişyariya çandî û pêşverbirina siyasî ya gelê kurd heye. Dive ku dûrî alikariya tundrew a ku bandorê li peyama medyayî ya rast dike,

a ku raya giştî dixapîne û jiyana civakê têk dide, aramiyê di herivîne û hildiweşîne. Lewma pêwîste ku bi berpirsariyê rabin û pê bawerî heya ku bibe mertala parastinê ji bo parastina kurdayetî. Siberoja xelkê me û bibtaybet li Kurdistana Sûrî wê bi hêz be û bi azadî û wekhevîyê bi serwer û edaletê serdest bibe. Ev yek jî ji bo Pêşxistina Siyasî dê hertim bibe piştgirî û ronak bike li ser bingeha armancên yê bilind. Û ji ber ku Kurd di aloziyên ewlehiyê dijîn, ev yek dibe alîkar ku hişmendîya civak û gel çêbibe û hewlên sextekariya siyasî li dijî wan têk bibe. Tevî ku pirsê Kurd li


seranserî duniyayê edî belav bûye, lê nayê wateya ku rewşa heyî daxwaza rehetbûnê dike, berevajî vê, rewşa heyî di derbarê rêjeya beşdarbûna kurdan wek nimûnek di nivîsandina Destûra Sûrî pir kême û ev yek pirsê nû derdixe holê. Bandora Kurdan gelo li tevgera siyasî a Sûrî û sazîyên civaka sivil heye? Lewma pêwendîya me bi têkoşîna berdewam a ji bo destveanîna mafên giştî û rewa di pêşeroja Sûrî de heye. Gelo mimkun e ku xebata yekalî bi serbikeve? Belê têgihîştina girîngiya yeknerîn, sûdwegirtina maf e.

Sîmaf Efrîn dîwana «Reşzeytûn» belav kir

Soz Xelil-Elmaniya

Helbestvan Sîmaf Efrîn dîwaneke helbestanan bi navê "Reşzeytûn" çap kir. Ev dîwan ji 123 rûpelan pêk tê. Dîwana "Reşzeytûn" dîwana duyam ya Helbestvan Sîmaf Efrîn e û ji aliyê weşanxaneyê Şilêr ve hatiye derxistin. Sîmaf ji Rojnameya Kurdistan re got: "Reşzeytûn 27 helbestên helbestên evîni, netewî, xwezayî û hin helbestên taybet ji bo stranan di nava xwe de hildigire." Her wiha got: "Bi dîmenên helbestên Reşzeytûn re, xwendevan diçe nav êşa Kurdistanê û germahiya yekîtiyê. Ji aliyekî din ve jî, helbestên min evîneke xwezayî.

Sîmaf Efrîn kî ye?



Sîmaf Efrîn ji bajarê Efrînê yê Kurdistana Sûriyê ye, û ji sala 2011an ve dest bi nivîsandina helbestê bi

zimanê Kurdî kiriye. Sîmaf Efrîn helbestê bi herdu zimanên Kurdî û Erebi dinivîsîne û gelek hebestên wê di kovar, rojname û malperên Kurdî û Erebi de hatine belav kirin û yekem komhelbesta wê ya bi navê Pişka Bin Giyan di sala 2021ê de ji weşanxaneyê Ava ve hat weşandin.

Reşzeytûn

Dayê!
Piştî ji navçûyîne
Di perdesûna biyanîyê de
Winda me..!
Li hişkbûna hembêza bavê xwe
Digerim..
Qeytanên bîranînan
Zelalbûna hişê min
Bi dar ve dike û bîrêkirin
Giyane dikuje
Tevî ku avahiyên bilind hene
Lê ez dikim bifetisim
Çenteyên min kêfxweşiyê
Hilnagirin...!
Ne desmalek e ji şaxên zeytûnî
ku hêstiran pê paqij bikim
Ne hewesiyên Lêlûn û Hawarê
Ku giyan li giyan vegehin
Weke çiyayekî, ramanên xewnên min giran bûne
Siba..!

Siba ..!
Ez ê çenteyê zeytûnî û gulistana bedewbûna xwe
bidim hev
Pêxas vegehim û herdu pîrên ava xwînî
qîtan dadîqurtîne, derbas bikim..
Kevza wê dûrî biskên keçika min
hişk bûye
Kî yê sermayaya bajêr bimalîne
Ji bilî kurtikê berşîrê min
Ez ê vegehim..!
Dizanim ku tiştê ji kolanên te
Nemaye..
Pîrozahiya te dagîr kirin
Li ser rûpelên bîranînan bi êş
ez ê vegehim..!
Ketina te..
Destdirêj kirina li ser te..
Qêrînan te..
Guhartina dîmenên te..
Binaxkirina te ya zindî..
Ji nav memikên te
Bihna termên komirî Bêhn bikim..
Çi bikim ez?
Tu tiştê agirê bîrêkirina te
Venamirîne..!
Ji bilî ku ez maçekê ji gîrnîjiya wê pakrewana bînav bistînim
Tabloya wê bi dergehê te ve
Nedaliqandî ye..
Ji mîrgên te yê şîr
Bermahiya ariya û miçiqandina zeytûnên reş

ber hev bikim
Bi hêstirên telaşmayî hêza çiyayî vedigerînim
Ez ê sermest vegehim..!
Parsa bihna reyhanan ji perdeyên
te yê dirêjbûyî bikim..
Bi qasî qulika êmzikê berşîrêkî
ez ê binivîsim..
Zaravayên ku wateyên navê te hildigirin
û nayên şîrovekirin
Li ser hewesên windabûnê
Ez ê serkêş bibim û xwe komî hev bikim
Da ku hinavên giyan û hindirê dil gerim bikim..!
Destmêja xwe bi xwêdana laşê te bikim..
Rêgeza nimêja xwe
Di gora te ya pîroz de Radigihînim..!
Tu.....
Tu dêra min î..
Perestgeha min î..
Mizgefta min î..
Li ser kêliyên bîrêkirinê xweşiya min î..
Bi dilgîrbûn xweşiya te giyan dagîr dike
Lê ez li biyanîya xwe winda me..!
Weke perperîkeke winda
Ez ê li te vegehim..
Di nav memikên te de
Ez ê bi hewesên Amanos şad bibim..
Bi dirêjahî, firehî û bilindahiyê derbasî hembêza te bibim

Weke Siyamed û Xecê..
Weke Mem û Zînê..
Weke Ferhad û Şêrîne..
Weke Cembelî û Binefşê..
Ez ê vegehim..
Di xurcika min de Hezar navên dildarên kesnenas hene..
Da ku ehrazên evîna min
Li nav çiya û newalên te temam bibin..
Li ser refikên şermkirinê bigerim
Bi çenteyên bêhêvîtiyê vegehim
Weke jineke evîndar Vedigerim..!
Ew vexwarina nayê vexwarin
Ji bermahiya şiqitandina darên qutkirî
Vexwim..!
Ez ê werim
Ez ê werim
Da ku giyanê xwe yê windayî û dilê qelsbûyî bibînim
Weke xanimêkê serê xwe bi qefdên beybûnên te tac bikim..
Dewat li ser şaxên sindîganê be
Nêrgizên çiya
Ji gulistanên te yê daliqandî
Ber hev bikim
Efrîna min..!
Evîna min..!
Mirî bim, zindî bim
Ez ê vegehim..
Termek bim..
Ez ê vegehim..
Ez ê vegehim..

Hayî be ji virra



Henan Cefer

-Dayîk li mal mijûle bi çê kirina kuftan, destê xwe di nav hêvîr da ye hêvîr distêrê hat bîrê xwê li mal nemaye gazî keça xwe Ciwana kir û got keça min pereyan be û dakev ji markêta Hêman xwê hûne û bilez were dema Ciwana daket û ket markêta dît hevalên xwe xwarinê ji xwe re dikirin emtîtan dilê wê bi wan ma û ew

jî bijok bû wê jî xwarin bi hevalên xwe re kirî û dema xwe bi wan re li kolanê borand bi xwarî û lêsê. Diya Ciwana ket meraq, xem û qiswetê keça xwe nehat dilmayî bû ji ber legena hevîr rabû destên xwe şuştin û ji berî cilên xwe biguhêrê li derî ket, dayîkê xwe girt û hêdîka got çima tu dereng mayî û kanî xwê ... keçikê sere xwe kir ber xwe û bêdeng ma, dema dayîkê carek din jê pirsî dev li hev gerand û got min pere hinakirin ...

-Carek din pere dayê û got hayî perê xwe hebe û vedereng memîn bikir û di ci de were...
-Daket daneket heman demê de hevalên xwe bi destê wê girtin û bi hev re lîstin vêca pere jê ketin û ji dil windabûn, li xwe hayî bû diya xwe li benda wê û xwê ye ket markêta xwê xwast û dest avêt berîka xwe sekir pere tune ne, maliq ma, Hêman markêta got xwê bibe ezê pereyan ji bavê te bigirim lê Ciwana newêrî û nizanî çibikê ji markêta derket û hat li

ser nêrdevana malê rûnişt û hêsir bi dizîka barandin, dayîk daket dît keça xwe li ser nêrdevanê rûniştî, bi destan girt çu xwê kirî û derketin malê bêdeng... li mal keça xwe kir hembêza xwe û jê pirsî kanîn perê teee û çima tu li ser nêrdevanê rûniştibû...
-Vêca bi rastî ji diya xwe re hewalda lê dayîkê ji xwediyê markêta têgihîstibû û bi keça xwe re got çima te derew kirin ev yeka ne xweş e, dayîkê xwe girt û lînedê û xwe li pêş vê

helwestê hêrs ne kir. Keça min bila tu zanibê kes ji virran hez û bawar nakê û virr mirovan dike dirûvên teng carek din wisa neke û li ber bayê hevalên xwe mekev e.
-Ciwana lêborîn ji dayîka xwe xwast bi şaş û çewtiya xwe hayidar bû soz da dayîka xwe carek din derewan nakê dayîka dilmayî dilgeş bû û got here wê pirtûka çîrokan bixwîn e heya ez xwarinê amede dikim